



Îbrahim



Art by [Signature]



Published by the Comic Bible Society, LLC
Copyright © 2021

Kingstone Comics maintains copyright to
this comic book as provided by United
States copyright law.

Print and digital copies of this version may
be freely distributed without penalty under
a Creative Commons license.

Du sal piştî tofanê, kurê Nûh Sam kurekî
anî dinê û navê wî kir Arpexşad.

Piştî ku Sam bû bavê
Arpexşad, ew 500 salên
din ma û bû bavê
kur û keçên din.

Êver bû bavê Pêlêg û di jiyana Pêlêg
de Xwedê erdê li Bircra Babîlê li
nav gelek zimanan dapeş kir.

Arpexşad bû bavê
Şelah ku bavê Êver
bû.

Yên Îbranî neviyên
Êver tên hesabandin.

Piştî ku li Bircra Babîlê ew yeka çabû, Pêlêg bû
bavê Reû, ku bavê Serûg bû, ku bavê Nahor
bû, ku bavê Têrah bû.

Destpêkirin 10:25; 11:10

Têrah bû bavê sê kuran; Avram,
Nahor û Heran.



Avram Serayê kir jina
xwe, ku yek ji
nîvxişkên xwe bû.



Piştî demeke kurt, Têrah kurê xwe
Avram û bûka xwe Seray hilda û ji bajarê
Ûra Mezopotamî yê berdar û
dewlemend derketin.



Û herwiha wî bi xwe re neviyê xwe Lût,
kurê Heranê yê mirî, hilda û bir.

Têrah û malbata wî pê
çemê Firatê ber ve bakûrê
rojawayê çûn û li bajarê
Heranê man.



Ji wê derê, wê mirov tev hildana heywan û milk
û hebûnan bi hêsanî ber ve warê Kenanê li
şûna derbasbûna çola mezin biçûba.



Piştî ku bavê Avram çû rehma Xwedê, Xwedê bi Avram re axavî û bi wî re peymaneke çekir.

Dev ji welatê xwe, ji gelê xwe û ji mala bavê xwe berde û here wî welatî ku ez ê nişani te bidim.

Ez ê te li wir bikim miletekî mezin û te pîroz bikim.

Ez ê nav û dengê te derxim û tê pîroz bibî.



Xwedê bi Avram û neviyên wî re sozeke ecêb çêdike...

Ew kesên ku te pîroz bikin, ez ê wan jî pîroz bikim û yê ku nifiran li te bike, ez ê wî nalet bikim...



...û wê hemû eşîrên dinyayê bi te pîroz bibin.



Divê em cihê konê xwe biguherînin û bigin dereke dûr.

Lê apo, keriyê peziyên min ji berê ve pirtir in û hê zêde dibin!

Ez bi vê yekê dizanim. Xudanê me yê herî bilind me pîroz kirîye.


Lê Xwedê bi min re bi zellatî axavî û got ku divê em mal û tiştên xwe bar bikin.




Yê Herî Bilind bi min re axavî û got Ew ê... Ew ê eşîrên dinyayê bi min pîroz bike.

Xwedê got, ew ê esse rê nişani me bide.

Destpêkirin 12:1-3




Deştêpêkirin 12:4-9





Hûn bixêr hatine welatê min, hûn dikarin
li vir bimînin. Lê divê ev jina ji min re li
qesrê bimine.

Ew xwişka min e; Ew ê
li gor dixwaza te bike.



Dema ku Avram li wir bû, qenci bi wî hat kirin.
Wî gelek pez, dewar, ker, deve û gelek
xulam û xadim stand.



Lê Xwedê bi wê yekê qet ne razî bû... Wek ku ev jina kê
bibe dayika miletekî mezin li nav komên jinikên ên
zilamekî din ma û ji halde ket.



Nexweşî bi me ket û li ser me tavilê
hat... Vî zilamî ku bi navê Avram tê nasîn
xwedêyên ecêb anî welatê me da ku mejî
me şaş bike û dibe ku me xerab bike.



Ev çi ye te anî serê me? Ew te çima li ser min derew kir û got ew xwîska te ye?! Ji min re xuya ye ku ew jinika jina te ye!



Bila ew mîr û jina xwe ji çavê min derkevin da ku tenderûştî ji nû ve bikeve mala min.

Bila ew û hertîşt ku bi dest xwe ve anîn ji vir herin û derkevin.



Apo, em ê niha ber ve ku derê herin?

Em vedigerin Negevê û piştra ba Bêt-Ûlê.

Bi van gelek keriyar re? Ma ew ê welat vê barê hilde?

Ev berket e ji Yê Herî Bilind. Hemû tiştên ku bi dest me ne niha ji destê Wî tîn. Wî qenciye li vi welatî ye soza xwe nişan da min. Divê ez li vê warê vegerim.



Ya Xwedê, te li gor soza xwe min li vê warê vegerand. Ez ê li vir pesnê te bidim û ez ê bihêlîm gelet me li vir bimîne û bike navê te were nasîn.



Pez û dewarên xwe ji vir derxîne.
Ew dikarin vexwin piştî em xilas
bikin û herim çarwanê!

Û yên te ji yên me baştir in? Pez û dewarên
Lût hêja avdane ne dema ku ew hewcedariyê
wan hebûn.



Mezinî me Avram xwediyê mezin e û wê
keriyên wî herdem li pêş ve herin. Îcar
hûn ji vir derxvin!



Apo, şivanên me li hev dixin. Pez û dewarên te wekî yên
min pir in. Ev erda têra me herduyan nake – Îcar
divê ez ji vir herim.

Dilê min nexwaze ku tu peyçûn di navbera
me de çêbe – Em meriyê hevdu ne û ez nexwazim
tu peyçûn di navbera şivanên me de
çêbe...Ka bi min re were.



Ka were em ji hev veqetin,
lê hemû ax li pêş te ye.

Tu dikari li pêşî aliyekî ji
vê axê hilibijîrî. Heger tu herî
aliyê rastê, ez ê herim aliyê çepê;
heger tu herî aliyê çepê,
ez ê herim aliyê rastê.



A li wir. Ez deşta avî ya li ser herdu aliyên
Çemê Urdunê hilibijîrîm. Ez ê niha herim û tiştên
xwe li wir nêzîkê Sodom û Gomorayê
barbikim û rûnim

Birazî min, biryara te li ser ser û çavê min e.
Îcar ez ê kon û tiştî miştî xwe hildim û li
ber darberûyên Mamrê biminim.

Wê bila aştî di navbera
me herduyan de hebe.



Li devera Nûheyva Berdar gelek şer û têkoşîn di navbera du padîşahan de ji ber hêz û dewlemendiye çêdibûn.



Yek ji wan têkoşînan li bajarên Sodom û Gomorayê tev wê derê ku Lût û malbata xwe lê rûdiniştin çêbû.



Ka em ê bibînin ew ê çi biwaze - Ez hêvîdar im ku ew hemû tev birazî min sax in û tu zirar bi wan neketiye.

Ezbenî, ka binêre. Ev yek ji şivanên Lût ber ve me vedigere.



Têkoşîneke çêbû û di nav de çar padîşah li dijî pênc padîşah hatin. Gelek hebûn ku li gelyê Siddîmê yê bi çalên ziftê ketin. Lût û hemû yên bi wî re ji dîl hatine girtin.

Ka tişteki hênîk bide wî ku vexwe û piştre ew ê rê nişan bide me.



Ka hemû şervanên me berhev bikin - Hejmara wan şervanan gihîşt 318. Mammrê Amorî, Eşkol û Enêr bi min re aligir in. Here ba wan û bila tevî me bibin.

Em a niha bi rêve digin ku em birazî min û malbata wî xilas bikin û biparêzin.

Wê wiha bibe, ezbeniyê min, Îbrahîm.





Li pişt gelê min nan û şerabê bîne ku
tu dilê xwe piştî serkeftina te ya
mezin hênik bikt.

Lê ez ê ji aliyê xwe ve tiştekî hê zêde
binim... Bereketeke ji Yê Herî Bilind û Berz.



Bila Xwedayê Herî Berz ku erd û ezman afirandiye
Avram pîroz bike û bila Xwedayê Herî Berz ku
neyarên te dan destê te pîroz be.



Û va ye ji te re, ya Melkisedeq, Kahîrê Xwedayê Herî Berz, ez ê
deheyeke her tiştî yê li vir bidim te. Ez ji bo vê serkeftinê
mezin û geure Xwedayê Herî Berz bilind dikim.

Avram, mirovan bide min û bila
mal ji bo serkeftina te ji te re
bimîne.


Na, ez vê yekê qet qebûl nakim - Jixwe min
bi navê Xudanê Herî Berz sond xwar.


Ez ê tiştekî te, ne ta û ne ji benikê
çaroxa te qebûl bikim ku tu nebêji:
'Min Avram dewlemend kir.'

Bila Enêr, Eşkol û Mamrê para
xwe ji vê meselê hildin û bibin.

Û li gorî min, ez tu tiştî ji destê te ne
dixwazim û ne ji ji xwe re dibim.








Lê ez ê wî milefî ku li ziriyeta te
zilmê dîke ceza bikim...



...û piştre wê ziriyeta te bi
dewlemendiyeke mezin ji
wê derê derkeve.


Lê tê ji bi xêr û xweşî di
emireke dirêj de di gorê
de werî veşartin.

Wê nîşê çaran ê ziriyeta te vegere
vê derê... Çimki hê gunehên
Amoriyan negihîştin dawiyê.



Ez bi te re peymanekê
çêdîkim.

Ez ê ev axa, ji Çemê Misirê bigire
heta Çemê Mezin ê Fîrat, bidim
ziriyeta te.





Ka ji min re xwarin û nêr bîne.

Ez tu tişt nakim, divê ez vehesêim da ku ez ji zîlamê te re zarokêkî xurt û bîhêz binim dinê.



Wê zarok bibe yê min ku ez ê wî mezin bikim.

Tu bi xwe nikarî vê yekê bikî, lê ez dikarim dixwaza mezinê me Avram bi cih binim.




Ev neheqî ji rûyê te hat serê min. Min cariya xwe kir paşîla te û gava ku wê dît ew bi zaro ye, wê ez biçûk dîtim.

Bila Xudan şahidê min û te be.



Min tenê bi gotinê te kir.

Ew di destê te de ye. Tu her çî dixwazî bi wê bikî bike.



Ey cariya sist û xav, ka ji min re wekî min ji te re vê sibê gotibû xwarinê hazir bike an ji ez ê te rind kotek bikim ku tu bînî bîra xwe ku ez mezinîya te me!

Tu tenê hêja yî anîna zarokêkî ku ez ê wî di nêz de ji dest te bibim û tê tu carî di dest xwe de nekî.







Ez Xwedayê Karîndar im,
bi min re bimeşe û
bêkêmasî be.

Ez ê wê peymanê ku min bi te re girê
daye berdewam bikim û zîrîyeta
te gelekî zêde bikim.

Êdî tê bi navê Avram neyê gazîkirin,
wê navê te İbrahim be, çimkî min
tu kirî bavê koma mîletan.

Ez ê te gelek berdard bikim;
wê ji te mîlet rabin û
padişah derkevin.

Wê peymanê min a
herheyî bi te û bi
zîrîyeta te re be.

Ez ê tevahiya welatê Kenanê yê ku tu
niha bi xerîbî lê dimînî bidim te û
zîrîyeta te ku her û her bibê
mîlkê we û ez ê Xwedayê wan bîm.

Va ye peymanê min bi te û bi zîrîyeta te re... Divê
hemû mîrên di nav we de sinet bibin... Yê ku li mala
we geşûne yan ku ji xerîban bi perê hatîne kirîn.




Herçî Seraya jina te ye, êdî
tê jê re nebêjî Seray. Wê
navê wê Sara be.

Ez ê wê piroz bikim û ez ê ji wê
jî kurekî bidim te. Ew ê bibe
dayika millet û padîşahan.



Lê ez ê peymanaxwe sala bê vî çaxî,
bi kurê ku Sara ji te re bine, yanî
bi îshaq re girê bidim.



Ma yê çawa kurekî ji
zilamekî sed salî û ji jineke
nod salî re were dinê?

Ka bila îsmail
mîrasxwarê min
be!

Erê bila be, lê wê jina te Sara kurekî bine
û tê navê wî îshaq deynî. Ez ê bi wî û bi
zinyeta wî re peymanaxwe her
û her berdewam bikim.

Min dengê te ji der îsmail bihişt û ji ber wê ez
ê wî piroz bikim...Ew ê bibe bavê duwanzdeh
mîran û ez ê wî bikim miletekî mezin.



Li gori emirê Xwedê, divê îroj ne
tenê îsmail û ez, lê belê her
kesekî nêr li malê min, xerîb
û nexerîb, were sinet kirin.

Destpêkirin 17:15-27





Ka jina te Sara
li ku derê ye?

A li wir,
li hindirê
konê ye.

Sala bê vê demê, ez ê esse
vegerim ba te û wê kurekî
jina te Sarayê hebe.



Ez navkêti me û zîlamê min ji kal
bû ye, yanî piştî vî emirî ez ê
bi çî yê xwe şa bibim?



Ew çima Sara kenîya û got: "Ma
ez ê piştî vî emirî zarokan binim?"

Ma ji bo Xudan tu tiştî
zehmet heye?

Ez ê sala bê, di çaxê ku hat diyarkirin
de vegerim ba te û wê kurekî
Sarayê hebe.



Ez
nekeniyam.

Belê, tu
keniyayî.



Divê em
rabin û herin.

Ka bila ez bi we re derkevim.
Ez dîzanim ku hûn ber ve
Sodomê dinêrin.



Ma tiştê ku ez ê bikim, ez
ê ji İbrahîm veşêrim?

Ew ê bæguman bibe miletekî mezin û
hêzdar û hemû miletên dinyayê
bi wî pîroz bibin.



Min İbrahîm hilbijart ku li zarokên xwe û
li malbata xwe emir bike ku bidin ser rîya Xudan û
ya rast û dirûst bikin. Bi vê yekê, ez ê
soza ku min daye wî pêk bînim.



Gazina li dijî Sodom û Gomorayê pir
zêde bûye û gunehê wan gelek giran e. Îcar ez ê
herim bibînim ka ev gazin wiha xerab e an na.



Lê ya Xudan, ma tê yên
rast bi xeraban re tune biki?

Lê belkî li bajêr pêncî
kesên rast hebin?

Ma yê dadgerê
hemû dinyayê
ya rast neke?

Heger ez pêncî kesên rast
bibînim, ez ê tevahiya bajêr
bidim xatirê wan.









Ma li vir tu mirovên te yên din hene? Yanî zavayên te, kur an keçên te, an kesekî te yê din hene?

Ka hemûyan jî ji vir derxe, ji ber ku em ê vî cihî wêran bikin.



Ji ber ku li ber Xudan gazîna li dijî wan wiha giran bûye ku wî em şandin ku em vî cihî wêran bikin.

Belê, du dergîstiyên keçên min hene, ez ê wan bi xwe re bînim.



Ev çi çirokek weşî ye, béguman te pir şerab vexwerîye.

Béguman tu henekan dîtî; Sodom yek ji derên ên herî asayî û berdare ku yek di tê de rûne û bîjî.



Hikimê Xwedê... HAR-HAR. Min bi vê yekê qet nebihîstîye.

Ev çi dîn e!



Bilezîne – Wê hema sibe be! Jina xwe û keçên xwe yên li vir hîlîne. An na, gava ku bajêr cezayê xwe bibîne, tê jî pê re helak bibî.

Destpêkirin 19:12-14



Divê em tu wext winda nekin!
Ro hema tê çekirin û wê sibe
bibe.



Bilezîne!



Bireve, canê xwe rizgar bike û li pê xwe
nenêre. Li tu dareke vê destê neseke!
Bireve çiyê an jî tê helak bibî!

Xweyê min, bi rizgarkirina canê min, te dîlsoziyeke
mezin bi min kir. Lê em nikarin birevin çiyê.
Wê ev felaket bigihîje me û em ê bimirin.



Ka binêre, bajarekî biçûk ê ku em ê
birevinê nêzîkê vir heye. Bi destûra te
ez birevîm wê derê û canê xwe
rizgar bikim.

Baş e, ez vê daxwaza te jî qebûl dikim. De bilezîne
bireve, çimkî hela tu negihîji wê derê, ez
nikarinî tiştêkî bikim.



Îdît, keçikno, êdî bilezînin!
Em hema gihîştin! Li gorî gotina
milyaketan jî me re, em dikarin
ji hikimê Xwedê birevin.

Ji ber ku Xudan li rastê deh rastdaran li wî bajarî nehat,
wî wêranî li wir li gorî soza xwe barand.





Xwedê wan bajaran û hemûyan ku li wir rûdiniştin û
tevahiya deştê û herwiha gul û giyayan wêran kir.

Destpêkirin 19:24-25



Lê îlîdît, ka were
bilezîne... Li pê
xwe nenêre!

Lê jina Lût li pê xwe li
Sodomê nêrî û bû
ştûneke xwê û ma.

Çaxê ku Xwedê bajarên destê wêran kir,
wî Îbrahîm anî bîra xwe û birazê wî Lût
ji nav wê felaketê deranî.

Lût li bajarê Soarê nema, çimkî ew ji xelkê li wir ditirsiya.

Dibe ku ew ditirsiya ku wêrankirina wan deşt û bajaran li stûyê wî were kirin.



Bêsinçî û bêexlaqîya Sodom û Gomorayê keçên Lût xerakirin û wan kir ku tiştekî xerab amade bikin.

Li vir mîrekî nêzîkî me be tune
û divê em zînyeta malbatê biparêzin
û berdewam bikin.

Were em îşev şerabê bi
bavê xwe bidin vexwerin
û ez ê herim bi wî
re razê.



Roja din êvarê, keça
biçûk çû ber bavê
xwe û bi wî re raza.

Ji ber serxweşî haya wî ji hatin û çûyîna wan tune bû.



Herdu keç bi zaro man û kur anin dinê ku bûn serekên Moavî
û Ammonîyan, ku di demeke dirêj de bûn dijmînên Îsraîlê.



Îcar Îbrahîm
koçî herêmeke
din...

Ev jina hanê gelek
xweşik û bedew e.

Belê, ev
xwişka min e.

Careke din, li şûna ku piştî xwe bi Xwedê bigire, Îbrahîm kir ku bi
xepandinê derbasî welatê Filîstîyan û padîşhê wê Avîmelek bibe.



Ji ber ku te ev jinik anî û
ew ji xwe zewicandî ye, tê bimirî.

Erê, ez dizanim te ev bi dilekî pak kir.
Niha wê lê vegerîne, çimkî ew jina ya
pêxember e.

Eger tu vê yekê nekî,
ez ê te bikujim.



Te çi bi me kir? Min çi neheqî bi te kir, ku
te ev gunehê mezin anî serê me?

Min ji xwe re got ku bi rastî li vir tirsî
Xwedê tune û wê ji ber jina min, min
bikujin.


Bi rastî ji ew xwişka min e,
an ku keça bavê min e.



Va ye ji te re Îbrahîm, ez pêz û dewar, xulam
û xadimên xwe didim te... Va ye welatê min
li ber te ye.

Û ji te re, jina wî, ez hezar perçe
zîv didim birayê te ku tu kes
dest nede te.

Û niha, ka ji min re û ji mala min re dua bike,
çimkî ji dema hatina we li vir, tu jinên ên
malê bi zaro nebûne.



Wek ku kurik mezin dibû, pirsgrêk ji li nav konê mezin dibû.

Bixwe û vexwe. Ji vir û ha da, kurê min Îshaq xwe li ser dayika xwe nagire. Ew niha dikare bi tenê bixwe û xwerinê rind tam bike.

Kurê wî! Û kurê wî yê li ba min?



Tu çi kurê? Tu hê nikarî bibezi û nêçir biki. Tu tenê bi gerandina li dora konan bi dayika xwe re jir î!



Vê cariyê û kurê wê biqewitîne. Bila nebin hevparê mîrasa kurê me.

Lê ew ji kezebê min e...

Na! Divê ew qet nebe hevparê kurê me Îshaq.



Ev yek li Îbrahîm pir giran hat. Ji ber vê, wî ji Xudan bersiva vê mesele yê zehmet xwast.

Wê ziriya te bi Îshaq bê naskirin.

Û ez ê kurê cariyê te bikim miletekî mezin, çimkî ew jî ji ziriya te ye.



Dotira rojê, Îbrahîm hinek tişt danî li ser
Hacer û Îsmail û wan şand derve.



Lê rêwîtiya wan li nav çolê pir dirêj
bû û av li ba wan nema.



Ya Xwedayê Îbrahîm, rehma xwe li
ser me herduyan bine... Ez
nikarim li mirina kurê xwe binêrim.



Netirse, Xwedê dengê
kurik ji wê derê bihişt.

Rabe, kurik rake û bi destê wî
bigire, çimkî ez ê wî bikim
miletêkî mezin.



Piştî, Xudan çavên wan vekir û bîreke nêzik
dîtin. Li wir meşka xwe bi avê tije kir.



Gava kurik mezin dibû, Xwedê
pê re bû û dayika wî jê re jineke
li Misirê dît.




Padîşah Avîmelek û
serfermandarê wî hatin
ba Îbrahîm.



Em dizanin ku Xwedê
di her tiştê ku tu dikî
de bi te re ye.

Ka li pêş Xwedê ji min re sond bixwe ku tê bi min re û bi ziriya
min re tu tiştên xerab nekî..., ku tê, wek ku min ji te re kir, dilsoz bî.

Ez sond
dixwim.



Seyda me Îbrahîm dibêje ku şivanên te dest
li ser bireke ku ew bi destê xwe kulandiye
danîne.

Ez vî tiştî a niha dibîzîm - Wê
bîr bi navê seyda te Îbrahîm be.
Ez ê bi xwe herim ba Îbrahîm.



Maneya van heft
berxên mê çi ye?

Divê tu wan ji destê min qebûl
bikî ku bibe şahidê kolangina
vê birê.



Bila aştî herdem li nav
malbata te û ya min hebe.



Padîşah vegerî welatê Filîstîyan
û Îbrahîm li Bîr-Şevayê dargezek
çand.



Û li wê derê navê Xudan, Xwedayê Herheyî hilda.

Pişti demeke, Xwedê baweriya Îbrahîm ceriband.

Îbrahîm!

Keremke,
Xudan!

Kurê xwe yê yekta Îshaqê ku
tu jê hezdikî hilde û here
herêma Moriyayê.

Li wir, li serê çiyayekî
ku ez ê ji te re bêjim, wî bike
qurbana şewitandinê.

Serê sibê zû, Îbrahîm rabû, kerê xwe kurtan kir,
bi xwe re du xulam û kurê xwe Îshaq bir.

Pişti ku Îbrahîm têra xwe êzing ji bo qurbana
şewitandinê kom kir, Wî bi rê ket û çû wê
derê ku Xwedê jê re li ser gotibû.



Di roja sisiyan de Îbrahîm serê xwe rakir û çiyê ji dûr ve dît.



Hûn herduyan li vir li ba kerê bîminin û ez û kurik em ê herin li dera hanê.

Em ê herin biperizin û paşê vegerin.



Îbrahîm êzing li milê kurê xwe Îshaq danî...



...û ew jî bi xwe agir û kêr hilgirt.

Bavo?



Bêje, kurê min!

Agir û êzing hene, lê bexê ku tê qurban bikî li ku ye?

Kurê min, wê Xwedê bi xwe bexê ji bo qurbana şewitandinê peyda bike.



...Piştire Îbrahîm kêra xwe hilanî ku
kurê xwe, kurê sozê, serjê bike.



Îbrahîm!

Keremke!

Deşt nede kurik! Niha ez
dizanîm ku tu ji Xwedê ditirsî
û te kurê xwe yê yekta jî
texsîr nekir.



Paşê Îbrahîm serê xwe rakir û
qurbana ku Xwedê peyda kir dît.



Wê navê ev dera "Wê
Xwedê Peyda Bike" bibe.

Destpêkirin 22:11-14



Gotina Xudan ev e: "Ez Xudan, min bi navê xwe sond xwar, ji ber ku te ev yek kir û kurê xwe yê yekta ji min teksîr nekîr. Ez ê te gelekî pîroz bikim. Ez ê ziriya te bi qasî şêrên ezmanan û sêlaka ber deryayê zêde bikim."

"Wê ziriya te bajarên dijminên xwe ji xwe re bikin milk. Û bi ziriya te, wê hemû miletên dinyayê bên pîrozkirin, çimkî te bi gotina min kir."



Piştê Îbrahîm vegeriya xulamên xwe û ew bi hev re zivîrî Bîr-Şevayê.



"THE BIBLE EXPLAINED
IN EVERY LANGUAGE."



SUPERBIBLE.TV